

Rûpela xebatê Koma B "danûstendinkirin"

Danasîn (fermî):

Bi awayekî argûmêntî xwe bi helwestên cûr bi cûr ve mijûl bike û heke pêwîst be, bigihîje encameke ku bi sedeman hatîye piştgirîkirin.

Danasîn (hêsankirî):

Li ser mijarekê argûmêntên erênî û neyînî kom bike, da ku ji wan bigihîjî biryarekê.

Spartek:

Danûstendinê bike, bi çî awayî bikaranîna dermanên kêzikan di çandina mêweyan de bikêrhatî ye.

- Nivîsê bixwîne. Hevokan kopî bike û wan li beşên *Pêşgotin, Argûmêntên Erênî, Argûmêntên Neyînî û Biryar* de dabeş bike.
- Li ser mijara "bikaranîna dermanên kêzikan di çandina mêweyan de" nivîsê bi argûmêntên xwe (erênî û neyînî) temam bike.

Nivîs:

Bikaranîna dermanên kêzikan di çandina mêweyan de mijareke nakok e. Ji alîyekî ve, dermanên kêzikan tînin bikaranîn da ku berhem ji kêzikên zîyanbexş werin parastin û ber were zêdekirin. Ev bi taybetî ji bo domandina dabînkirina xwarinê pir girîng e. Ji alîyê din ve, dermanên kêzikan bi metirsîyên mezin ve girêdayî ne. Ew bi demdirêjî dikarin tenduristîya bikarhêneran tîxin metirsîyê. Neyînîyeke din jî ew e ku kêzikên zîyanbexş berxwedanîyekê li hember van dermanan pêş dixin, ev dikare bibe sedema çerxeke xerab, ku bêtir dermanên kêzikan were bikaranîn. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku, metirsîyên bikaranîna dermanên kêzikan yê pêkan ji başîyên wan ên pêkan bêhtir in.

Pêşgotin	
Argûmêntên Erênî	
Argûmêntên Erênî yên taybet	
Argûmêntên Neyînî	
Argûmêntên Neyînî yên taybet	
Biryar	